

Dayik û bavên hêja,

Em we, bi sedema jidayikbûna zaroka we pîroz dikin!
Bi Pirtûkên Destpêkê (Buchstart), em dixwazî li ser rîya we ya hevbeş a di rêveçûna ber bi cîhana zimanan de, rêberiya we û zaroka we bikin. Gava ji destpêkê ve hûn bi zaroka xwe re bipeyivin, jê re hema çîrokan bibêjin û pirtûkan bixwînin, ew dilxweş dibe. Bi vê sedemê, ji bo her zaroka li Swîsre ji dayik dibe, paketeke Pirtûkên Destpêkê tê diyarîkirin.

Bi hev re ziman û çîrokan kifş bikin

Lênêrîna bi hev re ya li pirtûkên bi wêne, li ser peywendîya di navbera we û zaroka we de bandoreke erênî çêdike. Kî ji zarokan re bixwîne, ew demê, nêzîkbûnê û hestdariyê diyarî wan dibe. Zarok hez ji vê demê dikin! Xwendin jêhatîniya xeyalî ya zarokan li pêş dixe. Zaroka we bi vê yekê re ziman û cîhana bi lîstîkan kifş dibe. Zarokên, ji wan re ji biçûkî, bi rêkûpêk tê xwendin, dibin xwediyê gencîneyeke dewlemend a peyvan, bi awayekî siviktir û xweştir hînî xwendinê dibin.

Mezinbûna bi pirtûkan

Agahiyên li jêr nêrîneke kêr zêdeyî li ser zaroka we dide, bê di kîjan temenê xwe de çi bala wê dikişîne û pê re kîjan jêhatîniyê li pêş dixe. Ev agahî bi awayekî wekhev li her zarokê nayên. Her zarokek cuda ye.

6 mehî

Zaroka we dikare rahêje pirtûkê û gez bike. Ewê bixwaze, derxe holê, bê dikare vî tiştî bi destên xwe bixwe. Ewê bixwaze zanibe, bê tahma pirtûkê çawa ye, bê şiklê wê û hişkbûna wê li xweşiyê diçe, bê pirtûk deng derdixe an bêhneke wê ya teybet heye. Zaroka we, dikare rengên xurt ên berbiçav jî nas bike.

12 mehî

Zaroka we, niha tiştan hîn bi baldarî digre dest xwe. Ew êdî dizane, ku ew a di dest de pirtûkek e. Gava yê mezî tevî wê, bi hev re li pirtûkê dinêrin û jê re dixwînin, ew dilxweş dibe. Zaroka we, dikare wêneyan nas bike. Gava wêneyekî dîsa bibîne û nas bike, dibe ku destên xwe li hev bide. Ew dest bi têgihiştinê dibe, bê wêne serûrast an serûjêr rawestiyane.

18 mehî

Pirtûk, êdî ji bo zaroka we dibe tişteki naskirî. Zarok radihêje pirtûkê, hewl dide pelên wê li hev biqulipîne û bi tiliya xwe, wêneyekî şanî dide. Ew texmîn dibe, bê divê wêne çawa rawestî, lê ew nikare her dem pirtûkê rast bigire. Zarok, ji we dixwaze, hûn jê re bixwînin. Ew vê yekê, bi hemû rê û rêbaza xwe, bi xwe şanî we dide.

24 Mehî

Zarok pelan yek bi yek li hev diqulipîne. Ew peyvên, wêneyan didin nasîn, dibêje. Hevoka we dest pê kiriye, ew bi dawî dibe. Ew beşekî kin, ji çîroka guh daye ser, dubare dibe. Zaroka we, niha hîn zêdetir baldar e. Ew ji pitikên xwe yê lîstinê, ajalên paçîkî yan ji pisîkê re pirtûkan «dixwîne» û ew ji serê xwe çîrokan çêdike û dibêje.

36 mehî

Zaroka we, niha dikare bi pirtûkê re xweş bide û bistîne. Di dema xwendinê de baldar e û her cudayiya biçûk ferq dibe. Zarok, pirtûkê bi xwe ji xwe re «dixwîne» û li rûpelên herî zêde bala wê dikişînin, digere.

Piştire

Niha çavdêriyeke pir baş, a zaroka we heye. Ew dikare, ji xwe re tiştan xeyal bike. Tiştên we jê re vegotîye û xwendîye, ew tîne bîra xwe. Tiştên wê niha bihistîye, hema dixwaze tim û tim bi peyvên xwe, dubare bike. Ji bo bi we re bide û bistîne û bipeyive, ew ji xwe û ji we pirsan dipirse.

Di jiyana we ya rojane ya malbatî de pirtûk

Hûn ji bo bi zaroka xwe re pirtûkekê kifş bikin, têra xwe demê veqetînin. Derfetê bidin zarokê, bila ew bi rehetî li wêneyan binêre û bikin ku bala wê were kişandin. Îmkanê bidin zaroka xwe, bila ew pelan bi xwe li hev biqulipîne, pirsan bipirse û bi we re bide û bistîne.

Bi xêr hatine pirtûkxaneyê

Li pirtûkxaneyê pirtûkên, ku li hêviya ji aliyê we û zaroka we ve bi hev re, werin kifşkirin hene. Li gelek pirtûkxaneyan xebatên ji bo zarokên biçûk hatine amadekirin hene. Bi hev re stranên distirên, mamikan dibêjin, çîrokan vedibêjin. Hûn dikarin tev li wan bibin û jê dilxweş bibin.

Kî li paş Pirtûkên Destpêkê radiweste?

Pirtûkên Destpêkê Buchstart li tevahiya Swîsre, ji aliyê Bibliomedia û Institutaya Swîsre ya ji bo Zarok û Medya Ciwanan SIKJM ve bi hev re tê meşandin.

www.bibliomedia.ch

www.sikjm.ch, www.isjm.ch, www.ismr.ch

Agahiyên zêdetir: www.buchstart.ch,

www.nepourlire.ch, www.natiperleggere.ch

Kurdisch / Kurde / Curdo



Buchstart
Né pour lire
Nati per leggere
Naschi per leger